

SAL 2
HEJMAR 15
—
SÈSEM
1 HIZÉRAN 1943

RONAHÎ

SUPPLÉMENT ILLUSTRÉ DE LA REVUE KURDE HAWAR

ANNÉE 2
NUMÉRO 15
—
MARDI
1 JUIN 1943



DERYAVANEKİ RÛSÎ LI CIHÊ NOBETÊ

ÇABXANA TEREQIYÊ
ŞAM — 1943

DI VÊ HEJMARÊ DE

Selîka Rovi	Çiòkbêj
Dûvê Rep	Çiòkbêj
Lawîk	Stranvan
Dawiya seferekê	Xwedîye Ronahiyê
500 000 Fransız	Ronahi
Gelawej	Ronahi
Seyê ko gur tanî	Osmân Sebri
Veger	Silêmanê Teîho
Meixwîr	Smaînê Sêhedî
Cindiyê Japoni	Dilawer Çarpine
Di enîya rohêlê de	Ronahi
Rejhelek	Elefat
Amediyê û Sûlax	Salih Reşid
Mîneyr	Roja-nû
Cankêz	Bisarê Segman
Ey keça kurd	Cegerxwin
Ziyaret	Hisenê Perixanê
Xebat	Mela Enwer
Ger nexwinim	Cegerxwin
Zefera Efrîqayê	İlya Erenburg
Qewetên Ewîopayê	Hesenê Mistê

ÇIROKA KURDMANCI:

SELİKA ROVÎ

Gurek û rovîk bûne dest û birayêñ hev. Rojekê gur birçî bû; gote rovî go, ezê te bixwim. Rovî go, mal-ava ez û tu dest û birayêñ hev in, çawa tu dibêjî ezê te bixwim. Go bira qet fêde nakê ezê te bixwim. Rovî go, niha ko ez ji te re tişteki çêbikim ko tu bi roj heri nav kerîyêñ mih û berxan û kes te nebinê, tê min efû biki?

Gur go, heke tu tişteki wilo ji min re biki ez li dînyayê qenciya te ji bir nakim. Rovî go, de bide pey min.

Gur da pey û rovi berê xwe da serê çiyê û bi hewa ket, heta ko her du gihane serê çiyê. Hema rovî bi şivêñ ter ket û jêkirin, li ser hev kirine kom.

Paşê dest pê kir û selikek çêkir. Heta gihande nêvi gote gur, bira dê were tê de rûne. Gur ji hat tê de rûnişt û rovi pê ket. Hêdi hêdi devê selikê da hev, heta ko devê wê girt û qenc asê kir. Carekê dehfa xwe lê da û di këş henna wer kir.

Gurê gewir bi selika xwe ve serjêri navâ gundeki bû. Se û zarokêñ gund li gur hatine hev û gur di selikê de kuştin.

DÛVÊ REP

Sêrek û gurek û rovîk gihane hev û bi hev re çûn; rasti hespekt hatin. Sêr lepek li hésp da, kuşt. Gote gur go, bira tu goşte me par bike. Gur rabû herçî goşte nerm ji xwe re danî û hestî ji sêr re danîn û ûr û rovî ji rovî re danîn.

Sêr ji vê parkirinê pir xeyidi. Hema rabû ser xwe û lepek li nav çavê gur da. Serê gur kete erdê û dûvê wi ma rep.

Sêr gote rovî go, rabe tu vi goşti li me par bike. Rovî rabû, herçî goşte nerm û bez li ber sêr danîn û herçî ûr û rovî li ber xwe danîn.

Sêr go, rovî te ev eqil ji kû girtiye? Rovî go, minev eqil ji dûvê rep girtiye.

STRANA KURDMANCI:

LAWIK

Ji Müşê wê de zozan e
Pêçî û tiliyê xelkê delal mûm in şibî Şemedan e
Ez terka çavres û bejna zirav nadim
Heya qaz û quling vegerin deynin ser Mêrganê
Cem û qenê bayav Mûradê ker û lal e, deng jê nayê
Li dînyayê dosta mirov rind be
Mirov rakeve çar sala di hepisxana Diyarbekrê.
Eger felekk dost e, Xwedê rast be tiş pê nayê
Xwezi mala me cînarê mala we biwa
Sibê heta êvarê çavê min li qamet û bejna te biwa
Çiya bilind e, bi ser me de weylewyl kir
Qaz û qnlingê deşta Müşê
Serê xwe hilanî berê xwe berjêr kir
Rinditiya te a ewilli
Li ser xortaniya min zêde kir
Ez bîqrinîn tırba min bikole ji mala û wê de
Dibê şibak û pencera bîhilî tê de
Herçî roja inê were
Ser merzelê sêwiye ebdalet Xwedê de
Henek û yarı mane di dinê de
Darê mazi kevnar nabî
Berfa serheda lê bari
Nêçira min û kewa gozel li ser nabê
Wetenê mîrat sérin e, dest jê nabê
Ez terka çavê reş û bejna zirav nadim
Heya sıfîyan û tircal rabê,
Tasa xezala min zîvin e
Tasek av ji kaniya mala bîne
Dixwum naxwim tihiya dilê min naşkê
Roja qiyamelê ber mîzîna xêr û guneha dawaçî mo

D A W I Y A

SEFER Ü IMPERATORIYEKÉ

ELEMENY, BINGAZI, TRABLISXERB, TÜNIS, BİZERT

Seré Ewropayé li 1e Ilona sala 1939an, di ziké Ewropayé dê dest pê kir. Welê dixuye ko mizeferen vî serî en pésin, vî eri di Efriqayé, di erdekl ji Ewropayé 50 kلومېtiri dûr de, dê winda bikin. Ji xwe winda kirin. Lé em dibêjin dê winda dikin. Ji ber ko ew bi xwe hêj mikur ne hatine; çekén xwe dananfne, keftefefta dikin, di cankesiyé de li ber xwe didin.

Li 8e Gulanê danezanê hevalbendan da zanfn ko eskeren hevalbendan (ingilizî, fransiz, emîrîkanî) ketine bajaren Tûnis û l'szerté, talyan û elemanan ji ber baz daye; hin hêşir bûne, en mayfn kişiyanê nîvgirava Bonê. Lé ew ji kom kom xwe disperin hevalbendan.

Bi vê zefera mezin sefera Efriqayé ya ko ji sê salan de dom dike gîhaştiye dawiyé û peravên Efriqa bakur, peravên Behira-spi yén nîvro, ji Swêse heta bi Cebeltarî, tev de ketine desten ingiliz û hevalbendan û Behira-spi bû goleke ingilizi. Pê dawiya imperatoriyeke, imperatoriya talyanan ji hat.

Li 10e Hizérana sala 1940 pişte ko eleman li bakur gîhaştiye peravên Mansê û li nîvro bere xwe dane Behira-spi talyanen ko heta hingê,

ne keti bûn şer û bi gotarine pûç û bêar gef didan dinyayê, gava ditin ko Fransa reben şikestiye, wek teyrekî beratan xwe avêtin ser û qedere deh rojan şerê wê kirine. Fransa di wf hali de jî û bi tenê bi du sê fir, an li ber êrşa talyanan sekîn û ne hist ko ordiwa aşiq û sazbandan derbasi erdên wî bibin. Li nav wan deh rojan de talyanan pirek berhewa kir. Ew pir di axa talyanan, di paşıya ordiwa talyan de bû. L'ê paşı li xwe girtin.

Îtyale li Efriqayé xudan mistemlik û cfrana erdên Ingilizan bû. Hebeşistan, birekî peravên Behira-sor, Libye, Trablisverb hemi erdine talyani bûn. Mûsolini, rîberê Îtyale nû li lîbya û Trablisverbë eskerekî boş kom kiri bû.


Hevalbendên mihwêrê kar di nav xwe de lêk vekiri bûn. Welê dixuya ko l'ê Efriqayé talyanan girti bû ser xwe. Hitler Ewrope, Mûsolini Efriqe dê fetih bikiranâ.

Talyanan di sala 1940 de dest bi şerê Efriqayé kir û li 19e Tebexê ajotine Somalistanâ ingiliz û li 15e Ilonê dirêjî Misirê kirine.

Gava şeré Efriqayé dest pê kir, rojnamevanê talyanî û bi nav û deng, xeberdoxê serekê fasistan, sînyor Geyda di « Cornala d'Italia » de bendek nivisand û lê de goti bû: (Bi vî serî dê xuya bibe helê İtyale dikare bibe xwendiyê imperatoriyeke). Ji sînyor Geyda ve ev ser ji talyanan re fîmtihanek bû, fîmtîhana kişiwerkişayıya talyanan.

Hingê li Efriqayé heseb eskeren ingiliz nîn bûn; ji polisen çobidest pê ve. Talyan bi derba pésin ketin axa Misirê, çend kîlomêtiran pés ve çûn; gihastin Sidi-Beranf. Lé li wê derê sekîn, bi xwe sekînin, ew ne sekînandin. Çire? Heye ko bi xwe jî li xwe eccebmayî ma bûn. Ma çawan derbasî erde kî neyar bû bûn?...

Ingilizan, digel her tunebûnê talyan bi sün de vegerandin û ajotin heta tixûbên



TOPINE CENKEŞTÎKE İNGİLİZİ DIKIN AGIR BIKIN

500 000 FRANSIZ

JI BO SEFERA EWROPA YÉ DI BIN DARÈ SILEHÉ DE

Di zefera Efriqa bâkur de fransizan pareke mezin heye. Di wê qada ser de fransizan bi mîrdaniya xwe en'newi ser kiriye û bi temami ne be ji, kêm û zêde heyfa xwa ji elemanan hilaniye.

Ordiwa fransizi ya Efriqayê di nav şes mehanî de ji 20 000i gihaştiye niv mîlyonê. Genéral Giro li 20ê Çirriya-paşin 1942an li xeta ser 20000 esker hebûn. Li 15ê Kanûna-paşin miixdarê vi eskeri gihaştiye 45 000i.

Di Kanûna sala 1943an a paşin de eskeren Giro di xeta ser de bû bûn 50 000. Li 8ê Sibatê ev miixdar gihaşti bû 126 000i û li siseyê Adarê bû bû 315 000. Li 1ê Nisanê eskeren Giro gihaşti bûn hejmara 410 000i. Li gora texminê ev miixdar di van rojan de digel her sınıf eskeran, bej, behir û hewayê, wê bigehin niv mîlyonê.

Niv mîlyon esker di sefera vegirtina Ewropayê de ne tişteki hindik e. Ji xwe ev esker tev de fransiznjad biwan hingê qimet û giraniya wan bi şehinîne din diviya bû bihata kişandin. Ji ber ko hingê ordiwa Giro dibû ordûke intiqamê. Ma ji mîrê ko diçe heyfa xwe kî xurtîr e.

Trablisxerbe. Elemanan gava ev halê heval-bendên xwe dî, rabû ordiwek şand Efriqayê û şerê ingilizên kir. Ingiliz vegeryan; elemân heta bi Elemeynê gihaştin. Balafîren wan bi lîtîrek banzin digihaştin Iskenderiyê.

Bihîna ingilizan fireh e; bişkên ji li ber xwe nakevin. Ji xwe ewle ne, li sebebên şikes-tîne digerin; tevdîra wê dibînin; pê didin erdê û işe xwe dibin seri.

Ingilizan pişfî ko mistemekeyên talyanf yên Behira-sor vegirtin, zora xwe dan Libyayê, ordiwa Romel ya ko gihaşti bû Elemeynê, dan pêsiya xwe û ew ajotin heta Tûnisê. Romel li Bîzerte, Von Arnsm li Tûnisê asê bû bûn.

Ingiliz, fransiz û emîrîkanî pişfî erîşeke no ya ko 36 saetan dom kir ev her du bender ji standin û şerê Efriqayê gîhandin dawiyê.

Sînyor Geyda, ji bo şerê Efriqayê digot ko ev şer ji talyanan re fîmtihan e. İmtihan qedîya û Italye ket.

Hîtler pişfî ko Ewrope vegirt; digot Ewrope

GELAWÊJ

GOVAREKÎ EDFBÎ Û SEQAFÎ MANGÎ KURDI YE

Jimare 2	Sal-4	Şubat 1943
Bo Pfremerd	M. Emîn Zekî beg	
Sewéki nawqûpf	Piremerd	
Nateawî jinatman	Evdilqadir Qezaz	
Mîjwi edebiyeti kurd	Gîwfî Mukriyanf	
Emer Xeyam	Yûnis Reûf	
Tefsîri Quran	Şêx Mihemedê Xal	
Diwanî Gelawêj	Şêx Nîmetîlah	
Cexrafayî Kurdistanî	Iraq	
	Mistefa Şêx Nîmetîlah	
Bîsarani	Tahir Haşîmî	
Çiroki jmare	Naci Ebas	
Ferhengî kurdi	Tewfiq Wehbî beg	

We hendi basf xoştir exwénîne we.

Jimare 3	Sal-4	Adar 1943
Zimanî kurdi	Emin Zekî beg	
Newrâz	Piremerd	
Behari Kurdistan	E. Secadî	
Diwanî Gelawêj	Şêx Nîmetîlah	
Sekalayek legel gul	Remzi Qezaz	
Benc û binawani zi-manî kurdi	Tewfiq Wehbî beg	

Çiroki jmare N. E.

We gelî basf xoştir exwénîne we.

Jmar 4	Sal-4	Nisan 1943
Zimanî kurdi	E. Rewandîzî	
Dwawanî zelm û tan-	Piremed	
cemî		
Eskerêki dwanze salî	Şehab Mîhê	
Rese graneta	F. Mihemed	
Tefsîri Quran	Şêx Mihemedê Xal	
Diwanî Gelawêj	Şêx Nîmetîlah	
Benc û binawani zi-manî kurdi	Tewfiq Wehbî beg	
Mihakemeyî Gelawêj	Govan	
Çiroki jmare	E. N.	

We gelî basf xoştir exwénîne we.

Ji vê kovara héja re abone bibin. Ebona wê ji bo salekê dinareki iraqî ye, ji bo şagirt û fegehan bi tenê nvî dînar e.

Adrés: Gelawêj, kovara kurdi

Mirza Elaedin Secadî

Xana Esterabadî — hejmar (14)

Cada Semoël — Beðda

keleha min e. Belê Ewrope keleha wî ye. Lî rîberê elemanan ne hakîmê kelehe, lî girtiyê wê ye. İro ji dor dora kelehe ye.

Gelo qedera girtiyê kelehekê ci dikare bibe Di bendeke din de emê qala wê ji bikin.

XWEDIYÊ RONAHİYÊ

SEYÊ KO

GUR TANÎ FÊZA PÊZ

Di hejmarêñ berî vê da xwediye Hawarê û hevalê delal Qedri Can yek çirokên san nivisî bûn. Ev her du çirokên han ji bê sik hêjayî nîvîsandinê bûn. Di vî warfî da min ji çirokek heye. Heke bi xvesiya xwe, bi casf van her dûyên mayî nebe ji, ez baver im ko dê xwendevanan dilteng neke. Ditiyê vê çirokê ez bi xwe me.

Di tebaxa salâ 1923an da gurek hînî keriyê pezê min bû bû. Derî adeîê, her du rojan pîzeck dixwarin. Em ko di berê da xweyî pêz in, tim seyên no û şivanen serwest bi xwedi din, tu caran tîşen holê li me ne cewimî bûn. Keriyê min ê ko sê şivan, serşivanek û gar se-pandiyê wî bûn; dirêjiya salê di navbera 8 û 13 pezan da bi dev guran va berditan. Lê di meha tebaxa 1923 an bi tenê da nîşka bist mihiyên çak bi dev gurekî va berdan.

Jî ber ko serwextiya şivan û nobûna seyên min ji herkesi ra nas bûn; ev yeka han ji xelkê e fra me Mirdês ra ecêb dihat. Ji bo vê yekê, hin mehek kuta ne bû bû ko xelkê me navê min li gur kiri bûn. Herweki, cihê ko bigotana «şev gur pezeke Osman Sebri xwar» digotin; gurê Osman Sebri pezek xwar, an li filan cihî hate ditin. Edîgur bû bû yê min û bi navê min dihale sali dan.

Çi roja serşivan serê peza kuşî bianîna, min, dûr û dirêj jê dipirî û békériya wî dida rûyê wî. Li ser gotinê min ên giran, serşivê devê xwe dimizmîzand û bê ko gotineke rast bide dest min diçû.

Rojekê di a em li odê rânîşî bûn ko xortekî digot: duh gurê Osman Sebri berdaye keriyê Bîdosê (navê gundekî min c) û mihiyek biriye. I di çi gûrê ko di wê erdimê da pez dibir bi navê min dihale xwendin. Vê yeka han ez geleki kiz kiri bûm. Hin diltengî li ser min ne çû bû ko serşivanê min Mislimê Quçûl kete hundir û serê mihiyek kuşî li ber min dan. Di wê bintengiyê da hatina serşivê û anşna serê mihiyek neuh ez yekcar aciz kiri bûm. Mîna ko serşivan raste arê cinan were; bê xweragirtin, min hilmeyî ser camér kir û got:

— Kuro Mislim: edîf nema ez dikarim li ber vê pîsiya we şivanan xwe ragirim. Heke mihiyek din bête ku:tîn, divê hon her çar şivan ji terka pêz bidin û ezê her çar san ji bidim kuştin.

Mislîm xwesnasê e il û getinê min bû. Uergîya min bigota, ez nema jê vedigerim û min tanîn eih. Li ser gotina min Mislim sereki pûnişî û paşê serê xwe hilda û gct:

— Ev tifinga xwe bigire û were cem pêz, tuyê her tişî zani bî.

Pistî vê gotinê rabû û bi derket cû. Mislim, di seran da mîrekî çak bû; hindik dipe-yîvî û pîr dikir. Ji bo vê min geleki rî:n:etâ wî digirt û golinên wî dîbihîstîm.

Evarê pi:tî şîvan, min hî sê peyan mo tifingîn xwe hilda û e çâne fêza pêz. Her çar şîvan ji bi tifing bûn. Di her çar hîlîn fêz da em dudu bi dudu rûni:tîn. Mislim di rex min da rûnişti bû û deng ne dikir.

Sev e tarî bû. Her çar se hîdf hîdf di dora pêz ra dîçûn û dihatin. Hin çaryekekê sevê ne çû bû ko Mislim hidîka gote min:

— Tu zanî? gur dike were.

— Tu ji ci dizanî?

— Ev e, seyê mezin dike gaziye ke.

— Ma qey seyê mezin f xinîz c?

— Erê, tu niha bala xwe bid-e, ezê her tişî paşê ji te ra bêjim.

Li ser gotina Mislim min bala xwe da-yê. Seyê mezin li pêz bi dûr ket û mina



JI QADA ŞERÊ TÙNISÉ

Ordiwa ingîlîsan a heştan di qada Tùnisé de xeta Marête skênandiye û ordiwa Romel ber bi behîre ajotîye. Klîşa me çepêrine we xetê şanî dide, yên ko di nav zinaran de hatine kolan.

torpeki sipti di nava tariya şevê da wenda
bû û çû.

Çariyeket saet ne borî ko dengê zûrîna se
hat û du sê dengan li pê hev zûriya. Hin
cara pasin dengê sê ne hati bû birin ko di
niveka çiyê da dengê zûrîna gur jî hat. Mislim
gote min:

- Te dengê gur jî bilîstî?
- Erê, Ma hatina wî dê pir bajo?
- Niv saetê.

Di vê navberê da seyê mezin vegefi bû

cem pêz û herwekl ên din nobedariya hêlekê
(hêla ko gur dê tê ra weref) li xwe girti bû.
Pişti çaryeket saet dengê reyina san xurt bû.
Jê xweya bû ko bêhna gur kirine û hatin
nizik büye. Çend deqfqeyen din borin; se yekcar
har bû bûn û bi reynî dinê bi serê xwe va
kiri bûn. Mislim hidîka gote min:

— Qenc hisyar be, wê niha be.

Hîn Mislim gotina xwe ne qedandi bû ko
gûrîn kete pêz û li ser me rabû. Min tiştek ne
dili bû. Mislim bi destan salixa? min dida
û digot:

— Ev e mihiyek bir.

Min li dû-a
destê Mislim
nihîrl, gur li
stoyê mihiyekê
siwar bû bû û
dibir. Ma her
dûyan ca ser;
lê ew ji me
bezatir bû. Ga-
va min dît xwe
gilandin ne mi-
kûn e, me yek
dest tisling ber-
dan-ê; gur milî
berda û revî.

Ez serwexîf
tevayıya rastiyê
bû bûm. Seyê
mezin gur tanfî
feza pêz û dî
hêla xwe va rê
didanê. Dema
gur pez dibir,
heya seyên mayî
dihatin, seyê
mezin berê xwe
didane hêleke
din û sop li ser
gur bi wenda-
kirin dida. Si-
betirê dida ser
opê û diçû ser
bilata peza kuş
û têr dixwar.
Hînga ez vege-
rime ser Mislim
û min gotê;

— Ma ne
seyê mezin gur
tîniye feza pêz
û arşakîriya wî
dikîyi!

— Erê ezbînî

15



MA EV XORTÊ DELAL JÎ KÎ YE?

Ev xortê ha yek ji hezaran xorten fr. nsiz e ko terka welatê xwe e
vegirî daye û xwe gihandiye sergevazê hê'a général De Gol û di ordiwa
wî de büye balasîrvan û bombajên xwe berdide ser serê neyar.

haya min ji vê yekê heye.

— Maşir ko haya te jê heye, te çima ji min ra ne digo!?

— Ez ditirsiyam ko tu sé bikujî, ji lewra min ne digo.

— Ma gelo tu bê ji vî seyê xiniz ra kuştin nave?!

— Belê divê lê ne niha.

— Pi si ko pêz hemî bide gur û hîngâ em wî bikuiin!?

— Ezbenî, ev se seyekî ecêb xurt û jêhatiye. Dêla me di van rôjan da tê ye se. Min dil hebû ez carê, duduyan wî herdim ser dêlê û pa ê te serwextî çirokê Likim û hîngâ em wî bikujîn. Lê berî ko daxwaza min cih bibine, tu bi bêbextiya sê hesiyayî. Ji ho vê yekê min bê sebeb bîst mihiyên gewr bi dev fur va berdan; dem ne hat ko wî herdine ser dêlê û çend cewrên baş jê bistinim.

Di wê navberê da herweki seyê mezin zani be ko em :ora wî dikine, hatî bû pêş me. Hema min devê tisîngê da bin çeng û ling kışand. Pi si ko seyê xiniz heqê xiniyya xwe da, ez vejerim ser Mîslim û min get-ê:

— Heke li hêviya ehme jiya te Lîmâna, ji bo

tovê seyekî xiniz, dê te hîn gelek pez bidana der. Ma tu nîzanî ko ci tinawirê xiniz çeliyên wî ji xiniz dibin. Çe ko dêl ji wî ne hate se, an na min ew ji dikuşt.

Mîslim ji wenda bûna bîst mihiyan po·man ne bû bû û gotina' min a ko çeliyên xinizen ji xiniz dibin bi serê wî ne diket. Wi dizanî ko ez ji kizbüna xwe wan getinan dibêjîm.


Lê a rast, bingehê ramana min li ser wê yekê bû ko: ji seyekî xiniz cewrine baş û rast çar nabin u'mircî ji welê...

Îlin ji car caran ez di ramim û dibêjîm, ma gelo he i di destê Mîslim da bu?.. I ase tê bîra min ko Xwedê di quranê da getiye:

« U Nû i get: Xwedê, li ser eridê çejîkîfî ji lafran mehêle. Heke tu bîhîfî wê ekden te jîbî bi derxîn ji berî ko ji gelacan bê çeliyên kafir ti tek çar i ake.. » • Sîrey Nûh

Îlin xwe tecribeyen ko min di warê jîrê da dîfî, ev ramana han li nik min xuit kirîye. Ji çençan'ne çenc, ji neçençan ji çenc kêm caran çar dibin. În mayî herweki meseloka me kurdan dibêje: « Uya li ser koka xwe hîşin dibe »

OSMAN SEBRÎ



VEGER

BI BASKEKİ ŞEWITİ

• AERIOL SPEECH: AIR RAID ON MUNSTER •

Hin balaşirvanen ingilizi li ber radyowa Londrê xeba dane û biserhatiyen xwe gotine. Ew gotar dane hev û bi wan kütébek bi navê « Gotinîn hewayî » anîne pê. Me ji wê kütébe biserhatiya jérin bijartîye ew û berpeyi xwendevanen xwe kitiye.

« Tistê ko ez dikim bibêjim di bombaraneke Münsterê de li min qewimiye. Lê çi bombaraneke hêsanî. Qey di bin me re dijmin nîn bû. Çend ronavêj bi xetine spî-hezîn singa cemên tev didan. Lê herçî topê berbalafir çey laj bû bûn û zimanê wan nema digeriya. Çend derb berdane me û hew.

Me bombeyen xwe bi rahefi bera armancen xwe dan. Şewatine welê çêbûn ko ji rivîniya êgir mirov di ezmanan de nema stérk diditîn. Beriya ko em berê xwe bidin reya vegerê em careke din di ser bajêr re digeriyan û me tesfra bombeyen xwe seh dikirin. Ji nişkekê ve min balafireke dijmin dit. Balafir ji benderê rabû bû û qesta me dikir. Min dil kir ez diajo pê bihesinim. Lê telefona me ne dişixûli. Ji xwe di nav çend deqfqan de balafira dijmin xwe gihandi bû me û bera me dida.

Di vê navê de mitralyozkêş me è peş meserşmitêk aveti bû erdê. Lê em bi wê ji ne

hesiya bûn. Ji ber xerabiya telefonê em ji h e qut bû bûn.

Topê berbalafir ji bera me didan. Diajo pozê balafirê ber jêr da û qesta behirê kir û em ji dijmin vebûn. Lê xesarine giran gihaştî bûn balafira me. Motora milê çepê hati bû hingaftin, dolabênek daktezinê ji xesarzede bû bûn. Bêtela me ji nema dişixuli. Herçî mitralyozkêş me è pêş ew ji birindar bû bû. Berik li lingê wî keti bû. Ji her tisif xerabtir agir bi baskê. Me è çepê keti bû û boriske banzinê qul bû bû.

Me dida e nilê xwe û me digol, tu tevdîr ne maye; emê bêgav bimînîn û xwe ji balafirê bavêjin. Ji lewre me perasûtén xwe (sîwan) bi xwe ve kirin.


Hinan ji me depê balafirê qul kir û aleten agirkuj bera şewatê da. Lê bêfêde; ji ber ko agir ji me dûr bû. Me av, çay û qehwa ko bi me re bûn, rijande ser êgir. Ev ji bi kér ne hat.

Em gihaştî bûn peravên Denimarkê. Em perav perav diçûn û me temaşa şewatê dikir. Kumandar ji min pîrsi û got: Tu ci dibêji?

Min lê vegerand û got: Bi min be şewat kêm dike.

Kumandar gote min: Ji min re çêtir e ko ez şevekê li ser behirê bimînim, li gûna ko bî kevîm destê elemanan û herim hêşrigahê.

Kumandar holê got û rast bi rast berê xwe da Ingilterê. Min careke din li şewatê nîhert. Heke ez derketama derive û di seî



ESKERÊN RÜSİ YËN KO BERÊ: XWE DAYE QADA ÇEMÊ DON

bask re bixwişiyama û min xwe bigi-handa şewatê, ma ci dibû. Heye ko min ew vekûsta. Jo, mîkanistê me digot, ma tu dîn bûyi?

Bi balafirê ve werîsek hebû. Me flûqa kewçük pê girêdida. Min ew werîs gerande sînga xwe û serê wî da desten hevalen xwe û ez derketim ser baskê çepê. Peraşût héj bi min ve bû. Min dil kir ko ez jê xelas bibim da ko bikarim çêtir bixebitîm. Lê hevalan ne hişt. Min bi lingê xwe danî ser ca-xén hesinf. Bi zikêşki ez ber bi şewatê diçüm. Ba reya min dibirf û dikir min ji baskê balafirê veke. Min xwe lê dişîand. "Ez û ba em bi hev diçûn. Bi vê nevê ba ji min'xurtir bû û ez bi desteki dixebitîm. Min bi destê xwe ê din xwe li bask dişîand.

Min xwe gîhandi bû cihê ko dişewîf. Şewatê qulek çekiri bû û tê re li ber xwe dida û dikir bask tev de bigire. Qapaşke gir bi min re hebû. Ez dixebitîm qula ko agir jê derdiket bi wê qapaxê bigirim û bi vî awayî şewatê bitemirñim. Lê dema ko min dikir devê qulê bi qapaxê bigirim, bê ew ji destê min firand. Ez li ber qula egir bûm. Lê min nikari bû tiştek bikira. Ez destvala ma bûm; min nema dikari bû agir bitemiranda.

Piştî vê zehmetê ji min re tişteki din ne dîma, ji vegerê pêve. Ji neçariyê min welê kir. Gava ez ketim hundîre balafirê mideki ez bê his mam. Gava his hate serê min hevalan şewat şanî min dida." Bi emîre Xwede dê şewat vemirî bû.

Edî me nîzingî li peravêng Ingîstanê kiri bû. Ji nişkekê ve agir disa bi baskê çepê ket. Di bin bask re banzîn dîherikî. Lê ji xéra Xwede re gelek dom ne kir û vemirî.

Beja welatê me xuya kiri bû. Niho me xema daketinê dixwar. Me dolabêن daketine bi nepexeke ihtiyat nepixandin. Lê taxoka daketinê xesar-zede bû bû. Kumandar qerara xwe da bû. Li şûna balafirgeha xwe emê daketena balafirgehêke jê meztir.

Em gihaştî bûn balafirgehê. Me telêgrafa jérin kişând: « Em hatine bombaran kirin. Xesar gihaştîye me. Digel vê hindê emê bala xwe bidin ko meydana we xerab nekin ».



H E Ş T I R S İ W A R E K İ Ü R İ S

Balafirgeh ji me re bi ronf kiri bûn. Da-joyê me bi mehareteke welê danî ko tu tişte neadeti ne qewimî. Bi tenê balafirê xwe da têlén biderzî. Lê tukes birîndar ne bû.

Eve biserhatiya me ».

SILÊMANÊ FERHO

MERXWIR

Me çiroka jérin di kovara fransizi « En route, An Rût » de ditiye. Li gora kovaré ev çiòk ne xeyali lè heqiqi ye ù ev tişt di Gulana sala 1942an ù di gundeki Kemerûnê de qewimîye. Kemerûn di Efriqayê de mistemlikê fransizi ye.

Hergi klşeyén ko em bi çirokê re belav dikin ew ji yén kovara « En route » in.

Li Kemerûnê di gastina gundê Ciligayê de sê zarok giha bûn hev. Di dora wan de xelkê gund ji hevûdin re hûr mûr difirotin. Zarokan xwe ji bo nêçirê kar dikir û li serikên tiran digerian.

Didowên wan birayên hev bûn. Mezinê wan Jamfla, ji gundikî bi frengeki du hesinêni tij kîf bûn. Hesinine wêlê ko pê birînîne xedar çedibûn. Jamila dwanzde salî bû; xortekî qewin û bejinbilind; çavên wf bi ronahiya hişyariyê diciirisin.

Recali je bi du salan ciwantir bû û ev bûn du sal ko bi birayê xwe ê mizin re diçû nêçirê.

Heçi Talamî ciranê wan û héj heştâlf bû. Ev cara pêşin bû ko diçû nêçirê. Ji këfa Talamî re payan ne dibate dîtin. Talamî bi këfa nêçirê şevê pêde ne nivisti bû.

Gava zarokan daye rê héj dinya zelal ne bû bû. Her siyan tîr-kevanên xwe bi milên xwe ve kiri bûn û xencer li ber wan bûn.

Jamila da bû pêş û bû rôberê hevalen xwe. Talamî di meşê de ji hevalen xwe ne këmtir bû û bê dişwari dida pey wan.

Her sê hevalan xwe ker kiri bû û tiwan deng ne dihat. Di sewgira sibê de wek schwirine res di nav darén rôlén bêpivan re diçûn û carina desten xwe tavétin pelên dargerinan.


Dinyayê dest bi zelalbûnê kiri bû. Jamfla ji nişkekê ve sekinî. Bi tiştiki hesiya bû. Hevalen wî ji sekinîn û lê nihertin. Her siyan kevanen xwe kar kiri bû. Hêdi hedî dimeşîyan û di nav çiqilên daran re li pêş xwe dinihertin û li tiştikî digerian. Her sê zarok ji nû ve sekinîn û vê carê nema xwe tev dan. Di ber dareke kevnare re evorek veketi bû û vekes tanin xwe. Hêj nû ji xew rabû bû. Her sê tîr bi hev re ji kevanan silîtin. Ever bi du derbén xedar birindar bû bû. Jamila xencera xwe derêxist û serê wf jékir. Xwîneke sor û boş jê diçû. Talamî ji këfan da bû qevzan.

Zarokan bi benekî dest û lingên evor girêdan û darekî dirêj di lingên wî rakirin û bi këf û şadimanî nêçira xwe hilgirtin. Barê wan gîran lê këfa wan jê meztir bû. Bi vê këfê barê wan sivik dibû û zarokan dida lotikan, strandî û diçûn.

Carina xwe di ser kortalan re zer dikirin û li çeman derbas dibûn. Wextê ko di ser kortaleke bi stirf re xwe çeng dikirin stirfki dirêj û hişk, bi qasî şüjinekî de peyê Talamî rabû. Xwîneke boş ji lingê Talamî hat û zarak pê gelek eşiya.

Karwanê nêçîrvanan sekinî. Jamfla lingê hevalê xwe swişt û girêda. Ji nû ve bi rê ketin. Lë Talamî nema dikari bi hevalen xwe re bimê; e û bi şûn de dima. Wextekî wêlê hat ko Talamî yekcar ji rêvêçûne ket û rûnişti. Jamfla da eqilê xwe û qerara xwe da. Rabû birfna Talamî ji nû ve swişt û pihêt girêda da ko jê zêde xwîn neçe. Piştre jê re go tu li ber vê darê be, emê herin gund û ji te re darûbestekê bînin.

Talamî li bin darema. Jamila ú Recalf evorê xwe hilgirtin û berê xwe dan gund.



Sefara, bavé Jamſla
 û Recall, di gund dë
 bi tena xwe dijî. Xelkê
 gund jê direvîn. Jê
 ditîrsin û ji lewre jê
 re hirmet dikirin. Se-
 fara yekf ;erûdî û bela-
 ſros bû. Rojê pê de di
 nav rôlan de digeriya.
 Bi kéra xwe a tij
 bedena darén xurmê
 diqelaşt û şeraba wan
 vedlxwar. Evarê vedi-
 gariya gund û bela xwe
 dida xelkê.

Gava kurên wî giha
 bûn gund Sefara li
 ber koxika xwe veketi bû û temaşa hawîrdorê
 dikir. Kalo wextê çav bi evor kir hema kéra
 xwe derêxist û rahişte stirihêن wî. Dikir evor
 bigurine. Lê wextê zaroyêن wî jê re biserhat-
 iya xwe gotin ji evor geriya, xwe şidand û
 gote wan: Ezê bi xwe herim û Talamî sax
 û salim bñim.

Sefara beriya ko bi rê bikeve elam da
 mixtarê gund û bayê Talamî. Tagara, bavé
 lêwik bi xwe, ewçend li ber ne ket. Ji ber
 ko hergav di rîlê de tifaqine welê li xelkê
 diqewimfn û birfnadar bi lingén xwe vedige-
 riyan mal. Ji lewre Tagara ji xwe re digot ma
 ji Sefara çétir heye?...

..

Sefara lez da bû xwe û diçû hawara Ta-
 lamî. Hingûra evarê daketi bû. Sefara Talamî
 peyda kir. Talamî gava Sefara dît dilxwes bû
 û kent. Kalo ew dê xelas bikira. Sefara xwe
 lê xwar kir; herwekf ew bikira himbêza xwe.
 Lê gava kefa destê xwe û çepê da erdê bi destê
 xwe û rastê kéra xwe kişand û ew di qırıka
 lêwik re derbas kir. Talamî bê deng mir.

Sefara pişta xwe vekir, cendekê kurê cîranê
 xwe tê péça, ew kire pişta xwe û di rêne ji
 xelkê re nenas re vegeriya gund.

..

Sefara çû ba mixtarê gund û jê re da zanîn
 ko Talamî winda büye. Jê ve welê ye ko
 dehbak bi ser Talamî de hatiye, ew kuştîye û
 cendekê wî hilaniye.

Xelkê gund û qedere deh-panzdeh jenderme
 bi rîlê ketin û li cendekê lêwik geriyan. Sefara



7.4.2

jî bi wan re çû bû û xereteke mezin sanî da
 bû; lê bêfede. Herkesî qîma xwe anî ko dehban
 Talamî kuştîye û cendekê wî biriye.

Lê Likibî, mixtarê gund baweriya xwe pê
 ne tanî. Likibî li Sefara guhdar dibû.

Sibetîrê Sefara ji gund derketi bû û da bû
 rîlê, Likibî da pey. Sefara qederekî çû û pistre
 sekini. Li hawîrdorê fedkiri û kete nav darine
 himbiz. Likibî nîzingî li wan daran kir û lê
 sekini. Sefara jê ve xuya dikir. Sefara çend kuş
 dane hev û agirek dada; di nav devikê de
 stîlek derêxist û ew da ser êgir. Tiştek di
 nav stîlê de dikeliya. Sefara destê xwe dikir
 stîlê, jê tiştek derdixist û dixwar. Sefara mi-
 dekfî xweş bi xwarinê mijûl bû û pişî ko têr
 xwar li ser pişta xwe veket û nivist.

Mixtar xwe tev ne dida. Sefara qederê du
 saetan nivist û paşê hisyar bû. Sefara dîsa li dora
 xwe nihêrt û piştre ji stîlê çenîne göst derê-
 xistin û ew kirin kincikekf de.

Pişti ko Sefara ji ber stîlê rabû û da rê,
 mixtar hate ser û xwe li stîlê xwar kir. Tê
 de serîkî insanan û hin hestî hêj dikeliyan.

Heg di destê mixtêr de bû; yê ko Talamî
 kuştî bû ne dehbeyek bû.

Jenderman Sefara girt û ajote pêşberê
 mehkemê. Sefara nema dikari bû înakar bike;
 mikur hat. Bi fidamê lê hikim kirin. Mêrikê
 merxwir dane ber tifungan ».

SMAİNÊ SERHEDÎ

CINDIYÊ JAPONI

Li cem me, li Kurdistanê cindiyê botan heye û bi mirina xwe bi nav û deng e û jê re mirina botanî dibêjin. Lê em iro dikin qala cindikî din û mirina wi' bikin. Cindiyê japoni û mirina wi.

Diyaneta japonan diyaneteke ecêb e. Li nik japonan Mikado yanî imperatorê wan di yek wexti de Xudayê wan e ji. Ji bona wi' dijin, ji bona wi' û bi emirê wi' dimirin.

Kepitêneki emerikanî yê ko di Gina-nû de şerê japonan kiriye di heqê wan da tiştine xerib gotine. Ev in goinêk kepitên:

Li 23e Sibatê mècer Sirak bi birinîne sivik ji eniya şer vege riya bû. Heta hingê min şerê japonan ne kiri bû. Min ji mècer hin tişt li ser japonan pîrsin. Mècer li min vege rand û got:

DI ENIYA ROHELÊ DE ŞERÊ ZIVISTANË — Di eniya rohelê de şer li gora çax û mewsimê dignihêre. Li 22ê Hizérana sala 1941ê elemanan dirêjît ûrisan kir û Havînê pé de şerê wan kîrin, erdine mezin vegirtin û di qada nîvro de ketîne bajare Rostovê ji. Lê bi hatina Zivistanê érişa elemanan sekint û ya ûrisan dest pê kir.

Üris li elemanan zivirin, Rostov bi şûn de vege randin û di dirêjahiya eniyê de neyarênen xwe bi şûn de avêtin û bireki erdê xwe ji destê wan xelas kîrin.

Sal quipîf dinya bû Bihar, Havînê dest pê kir, érişa elemanan ji pê re. Lê érişa 1942an ji ya sala 1941ê gelek kêmîtir û qelstir bû. Elemanan dixwest bi vê érişê erdên Qevqasê tev de bistinîn û dest deynîn ser petrolen Bakoyê. Ne bi tenê ev pilan ne çû seri, lê erdê ko elemanan bi vê érişê xisti bûn desten xwe li gora par gelek hindik bûn.

Zivistana sala 1942an bi ser de hat. Eleman sekintin. Dor gîhaşte ûrisan. Bolşevîkan di vê érişê de zêde kîrin û di dirêjahiya eniyê de eleman bi şûn de vege randin û li gora par erdine fireh ji destê neyarênen xwe xelas kîrin. Yanî ûrisan zêde, elemanan kêmkir.

Herçî klişeya me sefheke şerê Zivistanê şant dide. Eleman bi hezar dişwariyan û di nav berfê re, bi erebeyine adettazad û çebirxanê dikişinin.

Japoni şerevanîne dijwar in. Lê di isttmala çekên nû de ne ewçend şehraza ne.

Mècer piştî ko ji min re wesfê mérantû nizama eskerên me da, di heqê japoniyan de bi ser ve zêde kir û got: Japoni çiqas bikevin tengiyê ji teslim nabin. Gelek caran û gava cih pir li wan teng dibe desten xwe radikin an destmaline spi li ba dikin. Lê ji vê mexsed disa ne teslimbûn e. Pê neyarênen xwe dixaplin û wan dixin dehfan.

Li 24ê Sibatê fermandariyê ez rîkiri bûm keşfê. Me gelek nizingî li xetên japonan kiri bû. Wezifa me keşf bû. Ji lewre hetanî ko em ne hatana ditin me agir ne dikir.

Li 27e Sibatê deh japoni li me qelibin.



Ew ji derketi bün keşfë. Gava me çav bi wan kir em li erdë pehin bün à beriya wan me dest bi agirkiriné kir. Bi japoniyan re tisfingine timatik liebün. Japoniyan xwe da ber daran ù li me vegerandii. Min eskeren xwe xiste şikile gewseké ù min dikir ez li neyarë xwe wer bém. Pişti mideki qewsa me li wan teng bù bù. Japoni pê hesiyän à beriya ko em li wan yekcar wer bén; terka faldeyên xwe dan à bi şün de kışijan.

Di bolikë de şes motosikil à timobileke zirehpüs hebû. Timobil piçük lê bi mitralyozeké çekirle bù. Timobil à-motosiklén me zülka bi rë ketin à beriya ko dijmin xwe ji me qut bikerê leğirtin. Emi li japonan çarnikar hati bün. hev. Edi min di dilê xwe de digot, japoni

bégav mane ewe teslim bibin. Bi vê imtde qederer çaryek-saet ez li hêviyê mam. Tu deleleten teslimê xuya ne kîrin. Ji bervajt ve japoniyan ağıre xwe xurt dikirin. Hingê min emir da à eskeren min bi destbombar bera wan da. Japoniyan ji bi destbombar bera me dida.

Pişti saeteké à ji nişkeké ve japoniyan xwe ker kir. Edi me ug dizant gelo tev de mirine, an dikin teslim bibin an dixwazin me bixapinin. Min du esker rékirine pêş da ko halé japoniyan ji me re seh bikin. Gava ew esker bi şün de vegeriyan me zanî ko heş japoni hatine kuştin; didowen mayin dar à cilo didin hev à dikin cendekên hevalen xwe ên kuşti bişewitlinin.

Li ser vê yekê em tev de ber bi japonan çûn. Wan gava em ditin qet deng ne kîrin, dest ne birine xwe à bi ağıre xwe mijûl bün. Yeki ji wan bi ingilizi dizani bù. Min jê pirst à gol-ê: Hon ci dikin.

Ewi got, em dikin cendekên hevalen xwe bişewitlinin. Ji ber ko em nema dikarin wan bibin qerargaheke japoni.

Sérjan Dâler ji van pirsı: We çire ağıre xwe betal kir?

Yê ko bi ingilizi dizant got :Ji ber ko cebrixana me xelas bûye. An ne me ne dihişt ko hon werin vê derê. Lè bi me re berikek ji ne maye.

Sérjan: Gava cebrixana we qedîya ma ji we re ne çêtir bù ko hon teslim biwan?

Japoni, desten xwe li singa xwe girêda à got: No, teslimbün fehêt à taluke ye. Eskere ko teslim dibe giyanê wi diçe dojehê. Lè yê ko ji bo Mikado dimire, giyanê wi diçe.....

Japoni gotina xwe temam ne kir à li vê derê devê xwe girt. Me zanî ko japoni bê hemtê xwe şlexili bù à heye ko tiştine zêde 'ji goti bün. Sérjan Bâler kir ko wan bajo à bide péşîya me. Her diwan peyên xwe li erdë şidandin à ji me hêvi kîrin ko heke me rë ne da wan ko hevalen xwe bişewitlinin, em wan ji bigehinîn kuştian.

Yê ko bi ingilizi dizani gote min: Heke em ji wezifa sotina hevalen xwe biggeriyan, me kari bù em intihar bikin à nekevin desten we. Ji lewre, an me bikujin an berdin em hevalen xwe bişewitlinin à wezifa xwe a dini bi cih binin.

Neyar bin ji, dilê min bi wan ve ma à min destura wan da ko wezifa xwe a dini pêk binin.

Di vegerê de em di cihê ko cara pêşin me li hev da bù re derbas dibün. Li wê derê sê kuştîyen me hebûn. Em li wan sekîn à me ew vesartîn. Japoniyan, gava çav bi kuştîyen me kîrin kentin. Vi keni ez aciz kîrim. Ez xeyidtm à bi erin min ji yê ko bi ingilizi dizani pirsı: Ma hon çire dikinen.

Ewi got: Kenê me ne ji këfê ye. Ji bervajt ve em li ber kuştîyen we dikevin. Ji ber ko ew ne ji bo Mikadoyê reb, lê ji bo peyakî mîna we, ji bo Rûzwelt xwe dane kuştin». DILAWER ÇARPINE



RESBELEK

JI XWENDEVANÈ ME È BERCOT

Divêt xwendexanén Ronahiyé çiroka « Erefat, kurê Brâhimî Ezem, ji mala Emo Reş » ji bfr ne kui bin. Heçi ji bir kirine an ew bend ne xwendine bila* kerem bikim li hejmara Ronahiyé a péncan iúpel 7 fedkirim û wé ji nû ve bixwinin.

Ji ber xérata wi, me ji Erefat re koléksiyoneke Hawar û Ranahiyé diyari kiri bû. Erefat piştî ko ew koléksyon girt, rabû û ji me re, wek her mirov medeni spasnameyek rëkir. Em wé spasnamê bi fexr û sikur belav dikin. Ev e spasnama Mirza Erefat:

Mirê min è giran û dilovan!

Pêş ez destê mirê xwe maç dikim. Mirê min bi şandina we ji min re civara Hawar û Ronahiyé ez nikarim çawan spasen xwe ji wé re pêşkës bikim. Ji ber ko behayé wé li cem min geleki mezin e.

Bi wé civaré serê min di nav hogir û hevalên min de geleki hilind bû û gelk ji ji min hesidin û çavén xwe li xwendina kurd vekirin. Ji ber ko ditin ko min digel xebala xwe a hindik ci şerif ji bin destê mirê xwe girt.

Mirê min ez dibêm ko hon dizanin ez ne meroveki dewlemend im û nikarimbihayé civaré pêk binim. Ji ber ko her peleki wé li cem min hêjayi, malê dinê ye; ji rojhîlat heta rojava. Ji bilù wé ji ez nikarimbihayé wan her çend herfîn ko li ser civaré hatine nivisandin ko navê min pêk tinin, bidim.

Mirê min ez nizanim ko axayê min Hesen axa malbata min ji we re daye zanîn an ne.

Ez yek ji neviyên Emo Reş im; ewê ko mirê Bota xwesti bû cem xwe. Ji ber ko mir bibisti bû ko Emo Reş mîrekî pir i qenc e. Wextê ko Emo Reş gotina mir bihist rabû kurê xwe sand cem mir û jê re got; gava mir ji te pirsti bêje ez im Emo Reş.

Lawik çû cem mir. Piştî ko rûniş; mir je pirsti ti wi Emo Reş. Go belê mirê min. Mir got-ê: Ma mér li ser ci rûdinin?

Ewi go, mirê min mér li ser qâna xwe rûdinin. Mir lê neri û deng ne kir. Piştî demekê careke din jê pirsî, ma-gêzer bi ci hildibin?

Ewi go: Mirê miş gêzer bi qılçikan hildibin. Mir got-ê: Bi eniya min tu, ne Emo Reş t. Tu here bila Emo Reş bê.

Kurê Emo Reş çû û her tişti ji havé xwe re got. Rabû Emo Reş çû cem mir.

Mir disa ew pirs jê kîrin. Emo Reş cihab da, go: « Mirê min mér li ser dile xwe rûdinin » û rabû ser kabekê û destê xwe bi ser mir de hejand û go: « Mirê min zerp gêzera hildikê ».

Mir keni û got: « Bi emiya min ti wi Emo Reş ». Mir hewraniyek li Emo Reş kir û destûra wi da.

Turbân-Spi: 27/1/1943


EREFAT

Ji mîrza Erefat re:

Mîrza, beri her tişti me ji te hêvi ye ko tu li me negir. Me resbeleka te gelekk dereng helav kir. Me ew di nav kaxezan de winda kiri bû. Bi hênceta hatina Cemil axa em lê geriyan û me ew peyda kir.

È didowan, li nik me awayê hinbûna te ji me re ji hezar iştirâkî lehatir e. Hema Xwêdê yên wek te di nav mîletê kurd de zêde Like. Pasi tu ji me re sax û kamiran bi.

XWEDIYÊ RONAHİYE



DERYAVANËN YEWNAVANÎ DI NEREGAHÀ CENKEŞTİKË DE

HÊSIRÊN ELEMANÎ DI QADA ŞERÊ ÚRIS DE



Eskerine elemanî yên ko cih li wan teng büye û bêgav mane xwe dispêrin úrisan. Ji xwe isal úrisan ji elemanan, nemaze di Stalingradê de gelek hêşir standine.

DI ETLANIÎKÊ DE NOQAREKE ELEMANÎ E BIRÎNDAR



Balaştreke ingiltîz ev nojar 'bi bombeyên xwe birîndar kiriye. Li ser vê yekê noqarê xwe daye rûyê avê û teslim büye. Vaporine mihaftîz noqarê dibin bendereke ingiltîz.

AMEDIYÊ Ú SÛLAV


Layê jorî yê Iraqê, gelek çiya û çelixtêt bilind hene. Li mabeyna van çiyan û çelixtan çiyayek heye dibêjin-ê Metina an Bişêş.

Ev Bişêşe gelek yê bilind e. Paşê hêdi hêdi nizim dibt û digehit geliyeki şox û can, dibêjin-ê geliyê Mizûrka.

Piştî hingê ev Bişêşe pehnati û dirêjahiya xo diraçinît heta digehite gireki gelek bilind. Li serê wî giri bajarê Amêdiyê dikevite xar. Li dora wî bajari şuhreke mezin heye. Ev şuhre li herê hatiye -çêkirin. Çu rê naçin-ê li bijli du dergehîn asinî. Ji êki re dibêjin-ê Dergehê Zêbarê. Ev şuhre gelek ya bilind e. Hindek rexet wê bi 30 heta 40 bejina ya bilind e.

Heta niho di nav çirokan û metelokan de dibêjin: Amêdiyê hatiye danan li berî Mihemed pêxemberî bi sed salan.

Geliyê Mizûrka geliyeki can û sax û şepal e. Li binê wî geliyê rengin aveke boş û cemidi û zelal derdikevit; herwektî befrê ya tazî ye û wek şiri ya spî ye. Dibêjin-ê (Ser û kant). Paşê ew dê bête belav kirin li ser rez û başan.



TOPÊN VEDETEKE EMERIKANI

Paşî hingê ev av dê kom bibite ve û dê çit ser rûyê erdi; bi dengektî bilind û şirin, bi çûneke çelek û delal, li mabeyna wan beran, bi dilekê xoş û çûneke can, herwektî bûkeke li şeva xenayê.

Paşê ev av li mabeyna giyayê kesk û darêt xemili dê gehîte kevirektî zor bilind dibêjin-ê Sûlav.

Bilindahiya wî keviri nêziki sed bejinan bilind e. Wextê av li serê vi firokeyî dê bête xar, bi dengektî bilind û dijwar, wekî dengê evrê Nisanê li wextê Paizê.

Ewî wextî zozanî têne Sûlavê û berê xwe didine vî rengê entike ko Xudê pêşkêsi xelkê vî bajari kîri.

Zozaniyên me vî demî req û hişk dibin, nizanîn berê xo bidene; vê ditina beheştin an hêlinêt teyra, an dengê bilbila, an xişexîşa belkêt dara yêñ ko hewayê nazik didet. An ava tazî û sîptî û zelal, an wan şkëftêt ko Xudê bi himeta xo diris kîrin. Au tiroşkêt rojê wextê beyana spêdê tê de derê serê çiyan û çelixtan. An ditina keskesori wextê roj li Sûlava rengin didet.

Wê gavê ewî hiş ji xo namînit û her rehek li leşê wî xo dihelavét li ber vê kîfê.

Ewî wextî ageh li xo namînt; herwektî ew li nav beheşte ye.

Eve ye Sûlava rengin, eve ye beheşta ser dînyayê.

Imîda min ya bi Xudê xoş e, bi wextekî kêm digehite mirad û meqûsda xo, dê gehîte xoşî û lezêtêt xo.

Edî bijit Sûlav û Amediyê bo xoşya Kurdistanê.

SBLIH REŞİD AMEDİ

MINERV

BISERHATIYA NOQAVEKE FRANSA ŞEREVANI


• L'AVENTURE D'UN SOUS-MARIN FRANÇAIS LIBRE •

Minerv noqaveke Fransa şerevani ye. Wê noqavê di dûrahiya peravêن Norvégé de vaporeke elemanni e petrolkêş bin av kiri bû. « Roja-nû » rojnamma kurdî ya ko li Bêrûtê d'est bi derkelîne kirîye biserhatiya noqavê li sei zimanê kumandarê wê û bi fransizi belav kirîye. Em wê biserhatîye werdigeyinîn Kurdmanciyê û berpeyi xwendevanen xwe dikin.

• Saet yanzdehê sîbehê bû. Di hindava Stavangerê de peravêن Norvégé ji me ve xuya dikirin. Bi periskopê (texlîek dûrebin) me dañ û zinar ji hev serq dikirin. Perav ji me ne ewçend dûr bû.

Ji nişkekê ve min vaporeke petrolkêş dit. Bandêreke elemanni lê li ba dibû. Vapor xweş hajî bû bar kîrin. Petrolkêş berê xwe dida peravê. Me lez da xwe û torpilên xwe hildan; yek... dido... me du torpil, pey hev herdane vapore. Her du ji lê ketin. Di rûyê behirê re' stîneke zîvin bi hewa ket û teqinek da pey. Minerv bi xwe bi ve teqinê hejîha. Agir bi vapore keti bû. Me hingultî bû orta keştiyê. Tu xér lê ne ma bû.

Lê niho halê me bi xwe di xeterê de bû. Ji ber ko gava di bin avê re du torpli têne berdan noqavî gîriyâna xwe kêm dike, yani siviktrî dibe û telbeyî rû dike. Ji bona vê yekê isûl ew e ko qewanêni torpilan pişti ko torpil ji wan derketine, vekiri dihilin û behir dekiviyyê.



Lê ev tişt hema zûka çenabê; jê re wext divêt.

Minervê, ji sivîkahîvê, wek maslikî veciniqî, di bin avê de xwe tev dida û bi hewa diket. Ji nişkekê ve me xwe li rûyê avê dit. Em li vapor-qeflê elemanni derketli bûn. Li aliye me è rastê, ji me bi çend metiran dûr, bertorpiyorke elemanni hebû. Jê hinek dûr vaporeke barkêş. Di ser me re ji bombavêjeke dijmin difiriya.

Edî.., ez nizanim ki ji me ji è din hétil dir heyretê de ma. Hergî vapor kësa lêxistinê li me ne ani. Lê balasirê mitralvoza xwe li me girêda. Beril li qalikê noqavê diketin, lê tê re ne diçûn. Ji xéra Xwedê re noqava me li rûyê avê gelek ne ma û beri deqiqelê neçi avê bû.

Dijmin pişti ko em ji ber çavêni xwe winda kîrin bi bombayêñ binavîn bera me dida. Bombe diketin dora noqavê; lê ne dihangastîne wê. Me bombayêñ pêşin hejmartin. Di nav cil deqiqeyi de 40 hombe berda bûne me; li serê du deqiqfan bombezey.

Me xwe tev ne dida. İşe me ma bû siûdê. Bombe dibarin û em dihejandin; hin perçe li galikê noqarê diketin. Lê ew yekcar qul ne dikirin. Lê em keti bûn ber xeterke din. Hewa noqavê a ihyiat kêm dikir. Jê re tu tevdîr nûn bû. Di vê navê de em di ser xwe re bi dengê perwanekê hesiyan û bombezey li rex me teqîya. Me tev de xwêh dida û hêlîdî bîhîna xwe digit û berdida. Tu kesî devê xwe venedikir û xebîne dida da ko hêkzojen zû neyête serf kîrin.


Em mihtaci hewayê bûn, ew hewa ko di ser me re bê pûl û bê pere bi dest diket. Singen me teng bû bûn.

Vaporên dijmin heta bi tariya sevê di ser me re digerîyan û carina bombezey berdidan avê.

Roj cû ava û reşahîya sevê dakel. Em nema bi dengê perwanan dihesiyan. Hingê me da xwe û em derketin rûyê avê. Em xelas bû bûn. Hin xesar gihaşti bûn noqavê. Digel yê hindê em bê arikari vegeterîyan wargehî xwe ».


ROJA-NÔ

DI BEHIRA SPİ DE NOQAREKE TALYANI BIN AV DIBE



Noqareke talyani dixir eenkosuke ingilizi bide bei torpilen xwe ù wê bin av bike. Lé hasal è male li sükê ne çu seri. Keştiya ingilizi ew firsend ne da neyarê xwe ù beriya ko noqar li xwe bixe'bite hingastê wê u ew qul kir. Noqar bin av dibe. Elhûqe en ingilizi çûne ser ù deryavanen wê xelas dikin.

VAPORQEFLÉYËN INGHÎ Í DI PERAVËN CEZAIRÊ DE



Vaporqeflekti ingilizi piştî ko di Cebeltariqê re derbas bûye digehe Cezairê. Ev resim ji pira vaporeke balaşîhilgir hatiye girtin. Li ser pira vapoîê hin balafir xuya dikin.

CANKES

• LE DIABLE DE GUY DE MAUPASSANT •

Gundi li poşberê bijşk û li ber texîe cankej ji peyan sekinf bû. Pîre bêdeng, lê hisyar û bi qedera xwe razf li van her du mirovan, yén ko pev re taxastin, dinihert.

Pîre dizanî ko wê bimiriya. Lê jê tu acizf gant ne dilda. Wexlê wê temam bû bû; gihaşt bû not û didowan.

Di derf û pencereyên vekirî re tava Tirmehe bi pêlan diket hundir û tihina xwe a germ lavête raxer genîmgos a bîhevkef. Raxera ko çar nîşênu gundiyan pê li kiri bûn.

Bihina ko ji zeviyen radibû, bîhina giha, genîm û pelên ko di bin gerîya tava nîvroye de kîzîf bûn, bi surceke gerîm digîhatê oda cankej. Herçî kuş di ser giyan re di riyan, li wan datanşin, disan bi şîre diketin û bi dengekî nîzim çey dixwendin.

Bijîsk dengê xwe bilind kir û gote gundî: — Honorê, di vî hali de tiwê deya xwe çawan bi tenê bîhfî? Tu nabînf, dike temam bibe.

Honorê bi acizf lê vegerand û got: Lê divêt ez genîmê xwe bikişînm hundir. Ev midyekek cêza me li erdê ye. Dinya ji xweş e. Çberê xwe dide deya xwe) yadet çi dîbêjî?

Pira cankêş hêj di bin hikimê çavtengiya xweserf normanan de, bi çav û serê xwe şaret li kurê xwe dikirin û digot: «belê»

Belê pîra cankêş, lê çikûz digot kurê xwe, tu here genîmê xwe bikişîne hundir û min bi tena xwe bîhîle, ne tu xem e.

Bijîsk enirî, lingê xwe li erdê da û got: Tu hemâ debhâyekî, lê ez nahslim tu ji ya xwe bîkî. Ü heke herbel divêt ko tu genîmê xwe fro bikişîn; here banf Rapê bike; bîla ew li rex deya te a cankêş rûne. Tu dibihisi, ez hólê dixwazim. Ü heke te ji ya 'min ne kir roja ko tu nexxes bikevî, ez li te miqate nabim û ezê o bîhilîm ko tu wek seyîki bimiri. Te seh kî?...

Honorê, gundîkî gir lê çels, bi e-qa mal-dariyê û ji tîrsa bijî k bê qerar, dudîl, devê xwe vekir û hêdîka got: Gelo Rapê ji bo nexwesnîriyê çiqasî dibe?

Bijîsk, bi erîn û bi dengekî bilind çîr kir û got: Ma ez ji kû zanim? Herc pê re xeber bide û li ser icretê pê re li hev were. Tiştê ko ez dizanîm divêt. Rapê heta saetekê li here hâzîr be.

Honorê hate ser qerarekê û got: Ev e ez diçim, tu mexeyide mîrzayê bijîsk....

Bijîsk ji pê re terka xêñî dida. Lê beriya

EY KEÇA KURD

Ey keçê rabe bixwîne, da tu serbest herbijt
Zû ji xew tu ser hilîne bes himine bê mejl.
Rêncbera hundir tu yi hes rind û jir û zane ye
Bo te bêhtir her divêtin xwendevani paqîjî.
Wa hevalen te li her der serbilind in pêş ve çan
Rahe iro ey keça kurd serbilind himre tu ji.
Ger bixwîni dê bîdi xwendin tu yê hundir tevan
Ger nexwîni kes ji bo te çes û derdan nakuji.

(CEGERXWÎN

ZİYARET

Ey serekên ho weten, seda kirin canê xwe
Ji ho doza me kurdan, xirab kirin xanê xwe.
Rehmet silav ji Xwedê, em ji we re dixwazin
Ber rehet bê qelbê we, em siyar in naçazin.
Li nav kurdan fidakar win nebêjin ne manê,
Çi bîkim felek qulibî, zeman ne ew zeman e.
Dilê xwe neşewtinin nebêjin kurd qeliyane
Hene gelek qehreman ji her zîlme heliyane.
Taqeta me nagîhê, tu firstet ji tunire
Hemî tazi birgi ne, li devîya xwini ne.
Helbet wê bê rojekê, emê zendê xwe bîldin
Xorten kurdan wê rabîn; zerî gava wê kil din.
Emê bîkin xêretê, xelk ecêba bîbinin
Emê heyse sê sed sal ji neyara hilînin.
Kurd wê bîbin ala rengin bîcikinin
Kes neyarê me ninin, em li bi kin in.
Tije kul in dilê me, ji bir nabin tucara
Ew kuştiyên şeritê: b'singo, living û dara.
Iro di bin erdê de, bê xwedî û bê gunan,
Ew birin pir xêdar in, bê ilac û bê derman.
Ey sehidî minewer, misterî bê qelbê we
Emê çekîn wê rojê quba li ser tîrbîn we.
Emê li ser qubê we, ala kurdî li ba kin
Win laşîql hurmetê, her sal bîkin ziyyaret
Çeyiya we mezin e, ji bir nabî mich-het.

Qetranî: 7 Nisan 1943 İHSÎNÎ PERÎXANË

ko jê veçete got-ê: Tu dizanî, gava ez dienirîm benekan nañim.

Gundi gava bi tena xwe ma berê xwe da
deya xwe û jê re got: «Madam ev mîrik dix-
waze, ezê herim Rapê bînim. Heta hingê li ca-
nê xwe mi 'ate be » û da re.

Raj ê, jînikeke sere û bi sinheta xwe útiçî
bû; kîneñî xelkê dikewandin. Jê pê ve notir-
vaniya nexwesnî giran û mirîyan dikir. Di yek
wexîf de cilço û mirise. Ji xwe gelek caran pişî
ko mirî dikirin cawê ko nemâ, ji derdikevin û
devê wî didiröt, dîhat mal û bi hesinê xwe û
germ çar evên ko mirovîn zîndî li ser raketana
an bi xwe dakirana, dikewandin.

Wek sêveke zinistanî a par rûqermîç, dëxsok,

bi çavtengstke bëeman çıkuz, ji zora kewandiné movikén pı̄ş a wê xwar û ji hev dûr, duta, navtengsikesti; qey Rapè ji tema a cankeşiyé kéf-xwe, dibù. Gava di civateké de rüdiniş hema qala miryan û awayé miriné dikirin. Her textlit mirin û cankeşî diti ban. I iré ev tiş, wek nêçirvané ko çeli li derbén xwe dike, kit kit dikir û bi her ser û beri ve, digotin.

Wexte Honoré hat nik pire, pire di taseké de bi milé aveke hejin çedidir. Pire bi vê avé beristiken keçen gundi dê bikewanda.

Honoré n zingi lê kir û got ê: Évara te xwe, halé te ci ye deya Rapè? .

I iré lê veçerand u got: Tu sax bi, tu çawan i?

— Herçi ez şikir ji Xwedé re. Lé deya min nec rahet e.

— Ma ci lê qewimiye?

— Bawer bika olçeka wê dar büye

Li ser vê gotiné pire destén xwe ji avé kışandın. Ava nilreng di destén wê re diherikin u di kümükén tilhyen wê re dilop dikirin.

Pire, gava sebeba ziyareta Honoré zanî, bi bendewariske xerib jê pirsî: Yanî imid tê ne maye

— Belê.bijşk digot, nema li ser piştä xwe radibe.., be fêde..

— Hingê li ber miriné ye?

Honoré hinek sekinti, da ejilé xwe. Gundî dixwest ji pire re tiştine welê bibêje ko pê diîte wê nerm bike û şyê xwe bi erzani biquidine. Lé tu tişt ne hate bira wi. Hingê rast bi rast gone pire:

— Min divê ko tu li ber serê wê rûmî û le miqate bibi, heta... heta dawiyê... heta ko bimire. Tiwê ji min ci bistim? Tu dizanî ko em ne mirovîne dewlemeden in. Tu dizanî, me mikarî bu em ji xwe re xadimekê ji binin. Ji lewre deya min bi not û du salén xwe ve bi qasî deh mirovan dixebeit.

Rapè bi giruni lê veçerand u got: Bazar dizane, notirvanîya rojê cihe, ya şevê cihe ye. Min du tarîfe hene. Ji de wlemeden re ji bo rojê pênc u ji bo şevê deh qemeriyan. Herçi feşir he è rojê sê û yê şevê şes, qemeri ne. Ji te re sisê û ;e;..

Gundi hinek sekinti, da ejilé xwe. Ma deya xwe nas ne dikir. Jinik bi emir mezin bû. Lé cane ñ qewin lê hebû. Dikarî bû heft rojén din ji di cankeşiyé de bimîne. Ferz e, bijşk goti bû, dike hema bimire. Honoré qerara xwe da û li Rapè veçerand:

— No, em bazareke din çekin, bazara ji bo heta dawiyê, ma ne çêtir e. Edî her yek û

XEBAT

Xebatê b'ken gelî lawan xebat her karê mérân e. Xwe hisyar kin hemî pêk va ne em mihtaci gencan e. Bişon gav û devén xwe ji vê xewa hon ji mêj ketin-e. Bişol we ma kesek ev rüke hon dibinn di xew da ne. Bizannî ko gunehkar in bi vê netrûsiya yêkear Hewe habit cewabek l'nik Xwedé sibîn li mizan. Li pêy we rakuri ev to hemî tuxmîn li dînyayê Ta her kes xod d'nyasiton le rojî tuxmîn kurdan. Bikin şerînê ji xo bes e bikin germe ji xo bes e. Nê hou zendasin in pêk ve hemî şerîn li bişan. Xebatê b'ken xebatê b'ken xebatê b'ken gelî lawan Xebatê b'ken gelî şeran k) ev rû bo me deman e. Dibejim ez heve, gehi ji halé xo no hûye qay. Ji her çar qurneta ev rüke xekkê l'ser we ferman. Ewan tekbur e ki tovî me bûm in hay hewye jê o. An ji bi wan bibin bende bi resk û hendif û nan e. Bikin gelwe giya hes ken be bê tirs û be bê pirs e. Kesek nebi bibejitun mîxâbin ew jî çet ganhan e. Gelî lawa ðe bun razi bi vi rengi bi vî tezî. Ü bişî vê hewê subhî dê hajone li kolan e. Xebatê bikin gelî lawan bizave b'kin gelî xorlân. U pêk ve kar bibin rîkê bezîn û b'ken cedidän e. Bi namusî bişin an ji herin bitmîn ji dînyayê. Çiye razi bi ve jinê li nik min ew ne insan e. Bişteşla bi te'n tîvil bi mirâvi ew ne vêtin biç. İlev dûjeh bisoje lê eger bê tîvil û te'n e. Bi mérâni murin çêt e bi sed cara ji vê jinê. Hezar qela û tif ser vê jîna b'edebxane. Xabatê bikin gelî lawan bizavé bikin gelî gencan. Qemî hûn xo bîkşîn der ji van kulum û mistan e. Drîvétin hon bibin yek leş bibin yek dil bibin yek cas. Ü pêk ve kar biken belki velken tûle ji van san e. Bi dengek hûn biken gazi bîbîn dijuin here zû ba. Çerîna te xelas, büye li nav van baû û mérânan e. Hülu rabin gelî lawa hülu rabin gelî xorta. Bi elmasra herin meydanê şer seyrana mérân e. Ev e lawê ciya alaçî û pêy ve hemî gavan. Dê gûri vi cihi kenu ez hezar laş û hezar can e.

MELA ENWER

GER NEWWİNIN

Destê şex maçı nekin ev şex ne qulbê razi ye. Èv ne din e, din mebe, din serxewbûna mi et e. Ser mebin ber lingén şex, kengê Xwelê Jérâzi ye. Ma ji bo din şer dikin xo tîren Feransa, ingiliz. Wa li Misrê xwin direjen hûn şehid û gazi ye. Ger newwinin dê heg û aña me tim tulan bikin. Ev nezauf, ev girani kareki nasa f ye. Rêncberê şex û mela ye karkerê aña û beg. È hina pêk ann e lê è hima canbazi ye. Èw kese zana divê tim wek Cegerxwin hukte qîr. Rast e wi zincir di mil de tim bi qîr û gazi ye.

CEGERXWIN

siûda xwe. Ji xwe bijşk digot gelekk dom nake. Heke gotina bişik rast derket tiwê kar biki. Lé heke heta sibê an jê bêtir dom kir sucû siûda te ye.

Rapè li vi gundiylî ecébmayı dima. Hela niho tucaran bi vê bazarê, bi erebi—bazar

notirvaniya miriyan ne kiri bù. Ma ev ne texlîk qumar bù. Gelo Hpnoré dixwest wê bixapfne. Lé Rapé ne ew kes bù ko bihata xapandin. Hédika li Honoré vegerand û got:

— Beriya ko ez deya te bibînim, nikarim tu tişf bibêjim

Honoré got, Baş e were em herin....

Jinikê destén xwe ziwa kirin û da pey Honoré.

Bi rê ve qet xeber ne dan. Jinikê lez da bù xwe. Herçî Honoré gavine welê tavétin qey di ser cowîne avé re derbas dibû.

Çelekén ko ji germiya nfvroyê pelixi, li zevyan pal da bûn serén xwe hildidan û hêdika li wan diorin. Qey ji wan giyane ter dixwestin.

Gava bi diyarf xêni ketin, Honoré ji xwe re digot: Heye ko heta niho saff büye....

Lê pîr héj ne miri bù.

Li ser pişta xwe veketi bù. Destén wén ên jar di ser betanî re wek lingine kevcalan giha bûn hev û li hev hati bûn badan. Rapé nfvzingî li textê cankêse kir û midékf lé nihert. Desté xwe da nebzen wê, sînga wê seh kir; ew axivand da ko dengê wê bibihise. Paşê derket derive.

Jê re qinyat çêbû ko pîr nagehe tariya sevê. Honoré jê pîrsi û got: Ka bêj....

Rapé got: Welê dixuye ko du rojan, heye ko sê ro jan jî bajo. Tev de bîst qemiri.

Honoré: Bist qemiri... ma tu din büyi. Îşe pênc şes saetan maye....

Rapé û Honoré dan ber hev, hevûdin gerandin. Jinikê pê didâ erdê; wext jî diborî. Honoré diviya bû genîm xwe bikişanda hundir. Honoré gava dît ko jinik dike here; got: Baş e, bila be, bist qemir... heta dawiyê, heta kefenkiriné, heta ko cendek bi rê bikeve.

Li hev hatin; Honoré berê xwe da céza gênim; Rapé çû mal hiri û singikên xwe anîn. Her holê dikir. Di nobetdariya miriyan de gore çedikirin; an hiri diristin. Carina ev kar bi icret ji bo xwedîyen cankêş jî çedikirin.

Ji nişkekê ve nexwesnêrê ji nexweşa xwe pîrsi heke keşe hati bû ser. Firê bi işaretan da zanîn ko no. Rapeya ko gelek dîndar û xudanteqwa bû hema baz da elam bide keseyê gund,

Gava Rapé di gastîna gund re bi lez derbas dibû zarokên ko té de dileyistin, lê nihertin, li hevûdin fedkirin û gotin ko herhal tiştek qewimiye.

Keşê da rê. Lawikê lajebêj da pêşiyê. Bi destê lêwik re zingilek hebû. Lëwik ew dihe jand û ji xelkê re dida zanîn ko rebaniyet di nav wan re dibore. Mirovén ko di zevîne dûr de dixebitîn, berê xwe didan keşê, sefqeyen xwe ên pehin datanîn û hetanî ko hewranîye spi di pist koxikekê de winda dibû, xwe tev ne didan. Jinîn ko xwe li zevyan xwar kiri bûn û qelle didan hev li ser pişta xwe radibûn, xwe li hindava keşê digirtin û xaç li ser rûyên xwe dikişandin.

Mirêşkén dora xaniyan ji saqoşê keşê û spi bîzdihayî bi hêlén xwe ên giran û qelew baz didin; qey digindirin. Ci

waniyek yê ko li mérgekê girêdayî bû; ew ji ji heybeta keşê veciniqf di dora singê xwe de dibeziya û dida pehînan.

Lawikê lajebêj kutikekf sor li xwe kiri bû û bi lez diçû. Herçî keşê, stoyê xwe li ser milekf xwe xwar kiri bû, lêvén xwe hêdika tev didan, diayek dixwend û bi giranî dimesiya. Rapé li dûvê karwên bû. Xwe yekcar xwar kiri bû, te digot qey wê here secdê. Destén xwe li ser singa xwe girêda bûn; wê jî diayek digot.

Honoré, gava ji dûr ve ew ditîn ji paleyê xwe re got: Ma keseyê me diçe kû dere?

Paleyê wî lê vegestan û got: Rebaniyetê diye deya te.

Honoré serê xwe hejand « Kf zane, heye ko » got û vegeyîra ser xebata xwe.

Keşê ayîna xwe çekir; cankêş teqdis kir û digel lêwik vegeyîra dêrê.

Rapé li ber textê cankêş rûnişt û lê temaşa dikir. Gelo xapiya bû; cankêşiyê wê gelek dom bikira.

Roj nfvzingî li erdê dikir û dizeriya. Sura evare bi pêline honik diket hûndir û baskên perdan li ba dikirin. Qey ew ji wek giyanê deya Honoré dikirin bifirin.

Deya Honoré bi çavine bel, bê tevdan û bi laqeydi li hêviya mirinê bû, mirina ko bi derengî keti bû. Nefesa wê a nizim, di qirika



wé a şidandı de carina diffikiya ú dixirt. Ma ew ne xiraxira miriné bù. Ev nefes niho wé bisekiniya ú ji dinyayé jinikek wé kêm biwa ú tukes li ber wé dé ne keta.

Bi tariyé ve Honoré vegeriya mal ú li deya xwe fedkirl. Gelek caran bi vi awayi nexwes diket. Destûra Rapé da ú jé re got: Sibe li saet pêncan.

Rapé: Sibe, li saet pêncan

: i rasif, bi spédé ve Rapé hati bù. Honoré sorba ko bi xwe çékiri bù dixwar.

Nexwesnérê jé pîrsi: Çawandeya te temam bù?

Honoré bi qerf got é: No, ji bervajî ve çétir c.

Honoré cù. Rapé bi awirine kür li cankêşé nihîrt. Halé nexwesé qet ne guhérî bù. Deya Honoré weke beré, bi çavine bel, destén wi li ser lihêfè, bêdeng radiket.

Nexwesnérê édi zanf ko vi işt wé gelek dom bikira. Se rojan, car rojan... heye ko hefteké ji. Rapé bi vê flîkîre dile xwe teng dikir ú nîfr il Honoré dikirin ko ew xapandı bù. Ü gava çav bi nexwesé dikir ewçend li wé jinika ko ne dimir, dihate xezebé ko ne dizant ci jé bike.

Rapé, ji bona ko erlîna wé deyné vegeriya ser xebata xwe ú rahiste singikén xwe. Lé çavén wé ji rûyê cankêşé é germeçî ne dibûn.

Nîvîro, Honoré hate mal, taşleya xwe xwar ú vegeiyâ ser céza gênim. Honoré bi këf bù.

Herçi Rapé ji erin ú xezebé dikir ko biteqe. Her deeqiqâ ko diborj jé re wek vi perey! bù ko jé didizin. Gava li nexwesé dinihert qey din dibû ú dixwest qırıka wé pîra qerade, vê jinika enûd ba bide ú wé nefesa ko wexté wé didizi bisekinme.

Lé gava dida egilé xwe, dildit ko ev tiştekî bi talûke bù; jé digeriya. Lé tişline ecgeb dihatin bîra wé. Daviyé nszingî li cankêşé kir ú jé re got: Te hêj şeytan ne dîtîye?

Nexwesé bi dengekî nizim lé vegeandîn got: No...

Li ser vê yekê Rapé dest pê kir ú ji pîre re çirkine bitirs digotin ú ew pê dibizdihand.

Jé re digot, beriya miriné bi çend deqşan şeytan li cankêşan xuya dibe. Şeytan di belge-heki şerib de ye. Sîrîhêna wi hene, sivnikêke dirêj li desif ve ye ú gava xuyanî dîke dîde ber qîran. Cankêş pîst ko şeytan dibinin nema xwe tev didin ú hema dimirin. Bi tenê fsal min bi çavén xwe çend caran şeytan, gava wi li cankêşan xuya dikir, dîtîye. Naven mirîyan hiltanî ú digot: Belâ li cem Jozéfin Lwazel, Ölf Ratyé, Sofi Pondegno, Serafin Grosphyé....

Deya Honoré di nav eihan de diqeliq, çavén xwe vedikirin ú li dawiya edê dinihert; qey li ti-teki digeriya.

Rapé xwe jé vedizi ú cù derve. Ji dolabé çarşevêk girt ú xwe lê pêça; parzonek bi rûyê xwe ve kir; düstanek li serd xwe kir ú lîngén wé dane ber jor ú rahîste destê sivnikêke dirêj. Ji dîl kelt bù helghê şeytan.

Rapé çend frax tev dan ú ew dan erde; singinti ú reçin ji wan cûn.


Nexwesnérê ji derlyé nexwesé ve da ú bi dengine hîsk ú şerib hilkişîya ser kursîkfî li sivnika xwe bi ser cankêşé de hejand.

Deya Honoré gava şeytan dît eqill ji serî cù, da xwe, kir ko rabe ú ji ber bireve. Cankêş heta bi nîvi li pîsta xwe rabû, mil ú sermîlen wé xuya kirin. Nefeseke dûdirêj ji singa pîre cù ú wek depeki li ser pişta xwe ket. Her tiş temam bù bù.

Rapé her tiş vegerandîn cihê wan; frax ji erde rakirin ú dantî ser refîkem metbeke û vegeiyâ nik mirîye. Hîdika nîzîngî lê kir, çavén wé yêñ ko kîri bûn ji kortikén xwe baz bidin, girlin; pîyanek dansi ser lihêfè ú ava mîgedes lê kir. Li ser ejnûyén xwe rûniş ú dest bi xwendîna dia mirîyan kir.

Evarê gava Honoré vegeiyâ mal ú dît ko Rapé diayé dîke da egilé xwe, hisabé xwe çekir. Di vi işt de xesiri bù. Xesara wi pênc qemerî bûn. Ji ber ko Rapé bl tenê du roj ú ißvan xebîff bù».

Dihok: 8 Gulân 1943 BIŞARÊ SEGMAN



ZEFERA EFRIQAYÊ

BI QELEMA NIVISEVANEKÎ ÛRIS


Rojnama rûsi « Stérka Sor » di heqê zefera Efriqê a mezin de bendek nivisandiye û bi kurlî tê de gotiye:

Beri çend rojan xortekî elemanî di « Frankfurter Zeytung » de berndek nivisandi bû. Wî zirtoleyî digot yekê Gulânê bi her awayî cejineke elemanî [1] ye. Belê ji bo bilbileki Gulân her Gulân e. Lê ji bo elemanan Biharêne ko didin pey hev ne weke hev in. Nemaze Behara vê saltê ji elemanan re ji Beharê bêtir Païzek e, xezaneke Païzê ye.

Bi vegirtina Tûnis û Bîzertê serê Tûnisê diqede. Hitler Efriqê ji dest da. Onbaşiyê tirolî

[1] Yekê Gulânê ji mêj ve cejina sosyalistan e. Di vê rojê de, hergav di bajarêne Ewropayê de nimayisin cêdibûn û emele û polisan li hev dixist. Hitler pişî ko likim xiste desten xwe yekê Gulânê kîne cejineke millî elemani. Ji milê din Gulana 1940î ji bo elemnan meheke zefere bû.

JINÉN EMÉRİKANÎ DI KAR Û XEBATÊ DE



Kîşa me jinine emîrîkanî şanî dide yêng ko ji bona bikevin xizmeta eskeriyê hatine û miraceeti hikûmetê dikan.

xiyala zeferên Napolyon dikir. Lê onbaş ne ket Moskoyê û ehramen Misirê ji ne dîtinê.

Sefera Efriqayê sefereke girane ye. Milyonek singoyen mîlîwerê di vê seferê de şikestine. Belê bêtirê van singoyan yêng talyanan bûn; çekine kêm. Herçî ji hebe çek çek e û miroveki bi çek zencirkiri şer bike ji, disa serevaniyek tête heseb.

Romel di richetê de çek û cebirxaneyine boş winda kirine. Hitler digot qey asêgehê Tûnisê êrisa hevalbendan wê bisekinîne. Lê vê Gulân gul ne dane Hitler. Di nav 36 saetan de hevalbend gîhaştine ber deriyên Ewropayê.

Tûnis hate standin. Talyanan ne bi tenê bajarek lê kişwerek winde kiriye.

Talyanan, di cankeşiyê de, dirêjî Fransê kir. Ci cezakî seza. Tûnis ji bo mîlîwerê bû mesileke hêstiran; ji bo hîalbendan pêpelûka zeferê.

Em silavan li zefera hevalbendê xwe dikan. Me bi hev re mîcâdele kir. Heke hevalbendan bi rîkirina çek û posatan arîkariya me kiriye; me ji bi du salén şer arîkariya wan kir. Em esker in. Qedi're eskeran dizanin.

Em silavan li ordiwa ingilîzi a heştan dikan. Em dizanin, ya ko reya zefere vekiriye ew e, ordiwa heştan e. Ordîwa emîrîkanî a ciwan ji bîhîna barûtê bîhîn kir.

Em bi kîfxwesîke mezin silavan li hevalbenda xwe a kevin Fransê dikan. Ji milê din me bi şahîke mezin seh kir ko eskeren général Leklîerk bi xwe ketine Tûnisê. Ji bo Fransizan Tûnis intiqama Parisê ye.

Em dizanin ko cidal wê sext û dijwar bibe. Dijmin ewê li ber xwe bide. Edî destê wî de tiştek me maye ko winda bike; ewê her tiştek bide ber cavê xwe ji bon ko kar bike. Em ji qîmet û hêjabûna hevalbendê xwe ewle ne.

Li Efriqayê her tiştek safi bûye. Niho dora Ewropayê ye.

İLYA ÈRENBURG

QEWEȚEN

KELEHA EWROPAYE

Bi şikestina ordiwêni mîhwerê û bi zefera hevalbendan sefera Efrîqayê gîbaştıyê dawiyê. Pîstî ko ev sefer safi bû dinya alemê çavén xwe berdaye Europayê û li hîviya sefera Ewropayê, daktekin hevalbendan beja Europayê ye. Mineqîdeki çêk i eskeri, kepten Mikçet, di vê bâbetê de bendek nivisandiye û tê de qala vê seferê û qewetên mîhwerê yên Europayê kiriye û gotiye:

Beriya ûrisa 1942an di bin emirê Hitler de 325 firqe hebûn. Ji van 325 firqan 193 firqe li eniya rohêlê qerar girti bûn. Bi wan re 38 firqeyen dewletén mîhwerê ên din ji hebûn.

Firqeyen mayin bi awayê jérin lêk vedibûn: 6 firqeyen elemanni à 34'en talyani di Balqanân de; 6 firqeyen xirwati, 3'en meceri à 20'en birxari bi wan re disekinin. Tev de 69 firqe. Qewetên Balqanê di bin fermandariya von List de ne. Ji van pê ve li Yewnanistanê 6 firqeyen din hene û ew di bin fermandariya général Hart de ne. Bi qewetên Balqanê re 375 balasîrên giran hene.

Li gora texminê li Fransê di bin fermandariya Rûndestêti de 36 firqeyen elemanni û şes firqeyen talyani hene. Li Italyayê di bin emirê Amriyoso de 40 firqeyen talyani û 700 balasîrên keyserling. Li Norvêjê di destê Falkenhorst de 10 firqeyen elemanni à 300 balasîr.

Pîstî hezimeta Stalingradê eniya rûsi ji drêjahiya xwe kêm kiriye. Beriya ûrisa 1942an Hitler di eniya ûris de 40 firqeyen ihtiyat hebûn. Wan eskeran di dora Kiyêv û Vaşovayê de qerar digirt. Hitler ev esker bê wext xistin xeta ser û pê serê Stalingrîde wînda kir, bê gav ma û bi şûn de vegeriya. Iro Hitler di xwaze bi 120 firqan û bi sihê din ên ihtiyat di eniya ûris de bisekine. Gelo ewê bikare?

Heke Hitler karl bi 150 firqan di eniya ûris de bisekine, bi qure'yên nt û heta Hiziranê heye ko 80 firqeyen din ên ihtiyat saz bike. Lê bivê nevê ew qewetên ha tucaran ne di qîmîta firqeyen mehiwbûyi de ne. Welê

dixuye ko erkanherbiya elemanî nema imidike ko bikare ordiwa ûris bi ergeke Biharê ji hev de hêxe. Ji lewre planêni wê hêj bêtir planine midafehê ne.

Di keleha Ewropayê de du dergehêne vekir hene: Spanye û Tirkîye. Ordîwên wan her du dewletan heta niho sirine vi seri ne. Gelo ev her du ordû wê tişteki bikin? Heke kîrin ewe ci bikin?..

Nema tête birê ko eleman dirêjî van her du welatan bikin. Ji bona vê yekê wext boriye. Herweki me got plana erkanherbiya elemanen tedefihî; midafeha keleha Ewropayê ye. Ji bo midafeha kelehe û di mehçetê de Hitler bi qewetên berdest, wê bikare 32 firqeyen ko di Fransê de bigehîne 1001 û çîlén ko di Italyayê de wan ji bike sed.

Ji lewre dema ko hevalbend dirêjî Ewropayê bikin ji wan re qet nebit 120 firqe divêtin: 75 ji bo xeta pêşin, 25 ihtiyat û 20 ji bo lehiwandina dijmin di qadine din de.

Iro qewetên mîhwerê di Ewropayê de bi awayê jérin heşidandi ne: Li Fransê 37 firqe. Li Belçique, Holende, Elmanyê 31 firqe. Di welatan Baltiqê de 7 firqe. Li Norvêjê 10 firqe. Li eniya ûris 232 firqe. Di Balqanân de 69 firqe. 40 firqeyen ko di Italyayê de ne divêt ew ji bi qewitine din batî bin zêde kîrin.

Ev in qewetên ko roja ko hevalbend pê li beja Ewropayê bikin, divêt bera wan bidin.

HESENÊ MISTÊ

Vient de paraître
HISTORIQUE SOMMAIRE
DU
CHAR DE COMBAT
LE MAITRE DU CHAMP DE BATAILLE
par le
Commandant L. FOUQUET
des F. F. L.
Ouvrage édité et diffusé par les soins du
service de propagande des forces françaises
combattantes en moyen orient.
DANS TOUTES LES LIBRAIRIES

HEJMARA HAWARÊ A 54an LI 15ê GULANÊ BELAV BÜYE. LÊ BIGERIN Û TÊ DE BIXWÎNIN:

Tefsira Quranê, Diwana Melê, Pêş kevin, Cejnepirozi. Ji wan re. Sersala min. Mela Ehmed, Graméra kurdmanci. Memozina Xanî. Pêloşî û sistî. Mela Evdilmecid. Chansons.

Kiriyariya Ronahiyê

Ji bo Sûriye Pênc lireyên sîri — Ji bo welatên din lirekti ingiltîz

Xwedî û gerinendeyê berpirsiyar : Mir Celadet Ali Bedir-Xan . Şam-Sûriye
Directeur Propriétaire: Emir Djeladet Aali Bedir-Khan. Damas—Syrie